
KAMRAN SIMO
LORÎNA PÊNÛSÊ
LORÎNA PÊNÛSÊ
KAMRAN SIMO
pirs
Ji dayîkbûna
li welatê dabaskirî
çavvekirina
li malbateke windakirî
bi naskirina
zimanê qedexekirî
bûme xwediyê
evîna pêpazkirî
ez im ev
îro ez
îca kî ye
qurbanê dîrokê
Îsayê xaçkirî
yan jî ez ?
Dema ku ez lewaz dibûm, evîn digirî. Ji girî û gazinên evînê kursiyên bin yêzdanan dihejîyan.
Bêrîkirirna dayê û yarê ez di nav pêlên hesreta xwe de difetisandim. Bablîsoka jîyanê gerdûn bi min dida pîvan.
Desmala destên bûka hêvîyê, ez ji bêzariyê rizgar dikirim û hêza berdewam kirina pêşbirkê dida min.
Ez dibûme dayîka xwe û min dilê xwe dikire rêzanê xwe. Ez li parçê dilê xwe yê min windakirî digerîyam.
Dostên virek, yanî dost xwiyayên ne dost, di vê berxwedanê de rojekê ji min re li çepikan ne didan û di navbirka bêhinberdanê de baş ne şervanîya min rexne dikirin. Bi tirsonekiyê ez tewanbar dikirim. Lê ez bi van gotinên qalaw û qura dikenîm. Min tahilîya şerbata şer, bi devê bapîrê xwe vexweribû. Ji bo wê bû ku min, kulîlkên aştîyê pêşkêşî xweşika xwe dikir. Û hêza bizavê min xurtir dikir.
Weşanên
DengêBotan.com

*KAMRAN SIMO*

# *LORÎNA PÊNÛSÊ*

# *Naverok*


Bablîsoka jîyanê........................................................5
dizên dîrokê .............................................................9
Şeva bê xew ...........................................................10
hêviye pakrewanan .................................................11
ferişteyên ku hêviyan dimeşênin ............................13
reva ji evîn ê...........................................................23
dîsa..........................................................................24
çirûsk.......................................................................26
ez.............................................................................29
xewna biyaniyê ......................................................30
dilo ..........................................................................32
pêla  evînê ..............................................................33
bûka hêvîyê ............................................................34
te dibînim................................................................37
dara min bê ber ma .................................................39
hezkirin ...................................................................40
gêj bûm ..................................................................41
dilê min rêzan e.......................................................42
xewn........................................................................46
Li cîhana xwe digerim ............................................47
peymana bi cîh ne hatî ............................................49
evîn digirî................................................................51
ma ...........................................................................52
çûna te.....................................................................53
bêje..........................................................................55
bêrî ..........................................................................56
pirs ..........................................................................58
hûn nizanin..............................................................59
kulîlka min!.............................................................61

xwezî bi xwezîyan tînim........................................63
binivîsim ................................................................65
gelo .......................................................................66
xeyal pîr nabê.........................................................68
dosto.......................................................................70
geryaneka di xewnê de...........................................73
Lorîna pênûsê.........................................................75
hesret.......................................................................77
dilbera min .............................................................79
ez û xwe .................................................................96
şahiya bi tirs...........................................................97
stêrên bê gor.........................................................102
xwe bişîne ............................................................104
vegera jîyan ê.......................................................108

# Bablîsoka jîyanê

Berî ez werime vê jîyanê, min di xewnên dayîka xwe de, "reşikê tirsê didît". Di nav tirsa xewnan de bûm. Destên pîrika bûyûnê yên sar li kamaxên min ketin. Bi lêdana destên pîrîkê re ez veciniîqîm, min qirî - girî kir. Ez digirîm lê pîrîk û yên dî dikenîn. Ji bo ku ez kur hatibûme dinyayê, herkes şa bûn. Gelo wan dizanîbû ku ez tawanbar hatibûme dinyaye. Ez bê îradeya xwe tawanbar çêbûbûm. Ji bo ku gelê ez ê bibima endamê wî, di çavên reşikê tirsê de tawanbar bû. Û her endamê nû tawanbar dihat dinyayê. Ji xewna reşikê tirsê, bi şeqama pîrikê di tarîreşa seqema şevekê meha sibat a 1955 de min bi girî çavên xwe vekir.
Nav li min kirin, lê wateya wî wan jî nizanîbû. Navê min kirin Faruk. Divê ku ez wijdana xwe xirab nekim. Paşnav ne wan li min kir. Berî ku ez werime dinyayê reşikê tirsê paşnavên bi zimanê xwe wetadar li herêmê belavkiribûn. Destûra paşnav hilbijartinê ji kesî re tune bû. Pêwîst bû ku herkes ji van paşnavan yekî li xwe bike .Ji paşnavên ku reşikê tirsê belav kirin Aslan bûbû para malbata min. Vêca navê min bûbû **Faruk** û paşnavê min jî bûbû **Aslan**. Min ne ji navê xwe û ne jî ji paşnavê xwe hez dikir. Navê

min mîna şalwarekî ku li mirovan teng bê, min ji xwe re teng didît.
Paşnavê min jî mîna kirasê gurîyan bê çawan laşên wan di xwerênê û qet naxwazin li xwe bikin. Paşnavê min jî bi gezan dihate min û ez gez dikirim. Roja min hêza hilbijartina nav û paşnavekî bi zimanê xwe di xwe de dît, şalwarê teng derxist û avêt. Kirasê ku ez gurî dikirim jî min bi şalwarê teng re qet qet kir û ew ji avêt.
Li meydanê min şûrê xwe kişand, bi nav û paşnavê xwe yê nû **Kamran Simo  Hedilî** li hemberê reşikê tirsê ketim nav bizavê. Reşikê tirsê peşî nedixwest navê min yê nû bêjê. Her navê min xirab dikir û cure curê navên xirab li min dikir. Paşî mecbûr ma navê min yê nû bi navê xwe re bejê. li meydana cengê carna min ew ditirsand, carna wî ez bêzar dikirim.
Dema ku ez lewaz dibûm, evîn digirî. Ji girî û gazinên evînê kursiyên bin yêzdanan dihejîyan.
Bêrîkirirna dayê û yarê ez di nav pêlên hesreta xwe de difetisandim. Bablîsoka jîyanê gerdûn bi min dida pîvan.
Desmala destên bûka hêvîyê, ez ji bêzariyê rizgar dikirim û hêza berdewam kirina pêşbirkê  dida min.
Ez dibûme dayîka xwe û min dilê xwe dikire rêzanê xwe. Ez li parçê dilê xwe yê min windakirî digerîyam.

Dostên virek, yanî dost xwiyayên ne dost, di vê berxwedanê de rojekê ji min re li çepikan ne didan û di navbirka bêhinberdanê de baş ne şervanîya min rexne dikirin.
Bi tirsonekiyê ez tewanbar dikirim. Lê ez bi van gotinên qalaw û qura dikenîm. Min tahilîya şerbata şer, bi devê bapîrê xwe vexweribû. Ji bo wê bû ku min, kulîlkên aştîyê pêşkêşî xweşika xwe dikir. Û hêza bizavê min xurtir dikir.
Di nav vê kefte lefta min û dagîrkerê çavsor de di xeyalê de bi tenê dimam. Çûna te, ez dikirime bîra tarî ya bêbinî. Vê tirsê ramanên min dixwarin lê feriştên ku hêvîyan dimeşênin li hawara min dihatin. Û bayê azadiyê bi ser lalenên lingên min de direşandin. Ew azadiya ku min tehma xweşiya wê, ji xewnên tarîreşê şevên dagîrkeran dizanî. Min ew ne dîbû. Lê min xweşiya wê ji bindestiyê nas dikir. Di vê bizava bêhampa de dilbera min, bi wan maçên xwe ji gezoyê şêrîntir ez li ser baskên stêran difirandim.
Îro 2003 ye, hê ev pêşbirk didome û şêrîniya maçê dilberê li ser lêvên min diherikin.
Lê yên min li ser pîyan digrin êşên min in!
Yên ramanên min di kenînin, pirpirîkên bihara dilê min difirinin, li ser kulîlkan digerînin, stêran didoşin û şîrên wan dimeyînin evînên min in!

# *dizên dîrokê*

li welatê me
şerên zeviyan dane destpêkirin
me diçand
wana diçinî
destên wan yên têr
li ser zikê me yê
birçî
bi qasî
me bikujin
ew dijîn
dîwarên koşkên xwe
ji kêlên gorên me
çêdikirin
û wisa em winda dikirin

23 12 2000.

## *Şeva bê xew*

Îşev jî mîna pirî şevan
mame hişyar
di nav van çar dîwarên ker û lal
bi pênûsê re bûme heval
bûme zêravanê
van şevên tahl û dijwar
bi ramanên ku sibê li min dibe bihar
dê bibînim
qendîl, Herkur û Sîpan
bêhn dikim
bilbizêk, nêrgiz û sosinan
îşev ez bûme
Bazekî çengzêrîn
Û çûme nêçîra ramanan
li çiya û zozanên jorîn
Û ez serejêr dibim
Newal û deştên jêrîn

04 04 1992

# *hêviye pakrewanan*

Belkî negihimê
lê dîsa dixwazim
bibime xwazgînî
biçime mala bavê
bibim bazin û xerxalên
dest û piyan
Guharên guhan
gulçîna kilên çavan
ristikên gerdenê
kirasê sor ê bejnê
bi şanazî serî bidime
vê evînê
ne bi xwestina xeyalan
bi xwêdana eniya karkeran
bi dasa desten gundiyan
bi durûşim û berxwedanên bajaran
bi xwîna stêrên asmanan
bi hemû şeweyên  bizavê
gurzê Rostemê Xurt
awazên Sîyahpoşê Kurd
evîna Seyi dayê Cizîrî
gazinên Feqiyê derbiderê xwînî
gotinên Xanî
û hewarên Pîrê Torî

belê dixwazim
wek wan bibim xwazginî
ne tenê ez im
pir dixwazin û bilez in
Cengewarên serê çiyan
dîlên li bin qamçîyan
mîlyonên bûne derbider
têkoşînê xweş dikin li her der
pêkve emê xweş kin
dîlan û govendê
li xwe vekin dergehê vê bihuştê

20 09 1989.

# *ferişteyên ku hêviyan dimeşênin*

Toz û dûmana
gevzoka ramanê
ji hêstên goristana veşarti
ji welatê dengbirî
ji warê pakrewanan
ji gora evîn û ciwanîya min tên
bi teşîrêsiya ramanên xwe
bi bayê hewar û nalînên dilê xwe
maçê birçîyên lêvên xwe
gulên min av dayin
ji kaniya çavên xwe
rik me wir
bi keştiya dilê xwe
ji deryayê derbas bibim
werime wir
cihe bîranînên min
hûn hogirên asoyê min
hûn nêrînên xwedayî
û xemlên ramanên min
çawa bû me hev winda kir?
hevalên lîstikên min

weke gera li mirina xwe
li we digerim îro
hûn xoşewîstên goristana bê nav
ji we bêhna
misk û emberê
tê min
A dilan melûl dikê
çavan şil dikê
hestên bêkesîyê radikê
di bin konê reş ê vê şevê de
bûme serwêrê tenayîyê
lê yê dewlemend
û bawerî bi hatinê heyî
ez im
xwediyê we me ez
hûn hê xwedîyê min in
bêjin ji min pê ve
kî weke fêkiyê negihîştî
ji darê ketiye?
weke çûkên baskşikestî
ji hêlînan ketiye
mîrastgirê evîna we me
Û mîrastê we me ez
kulîlkên siruştê
reng û reng
vedikin  ji we ra

ji bo em nêzîkî hev bin
em hatibûn afirandin
hûn ên ezizên giyanê min
hûn ne weke reşikê tirsê
ji bo min bitirsînin
û ne weke çûkên tirsonek
hatin gel min
û hesreta min
hûn jî wek min
ji wefadariyê ra
hatibûne  afirandin
xwedi hest û hûner bûn
di ciwanîya we de
hûn kuştin
pir zû bû ji birina we re
hûn kulilkên
li ber serê yêzdanan
hûn bê dem
bê xatir xwestin
çûn
lê hûn ne ji min reviyan
ez jî
ji we nereviyam
di nav bablîsoka jiyanê de
me hev winda kir

ev bê wefadariya me
li  hemberî  hev  bê  tewan e
ji bo min bifetisînin
hûn kuştin, hûn
ey ferişteyên ku
hêviyên min dimeşînin
hûn ên kenê li ser lêvan
bi silavên çavan ra
çûyî eva
hûn kuştin
hûn dilêrên
li ber dilên dayîkan
hemû êş û îşkence
bi we kirin
rimên avêtine
malzaroka giyanê min
ew rimê çavsor
li we ketin
ji ber ku hûn
rayên dilê min bûn
hûn hebûn û nebûna  min bûn
tîrên xwe
avêtine cihê zû
gîyanê min bikûjin
Ahrîmanên tarîperest
tiştê bi min kirin
mirovkujî çi ye?

ji kuştinê xirabtir
bi min kirin
tiştên cîhê wan
nayê dagirtin
ji min standin
ji min ra bêjin
ey neyarên roj û roniyê!
me we ne kuşt
xortaniya min
xeyalên min
hêjayiyên evîna min
we hevalên
leyistikên min
ji min standin
vê çelenga gulan
datînime
ber giyanê wan
yên pîroz û bîranînên wan
lê naletê datînime
ber navê we
ey xwedayên xirabiyê!
zelaliya baweriya min
û dilovaniya min
ji her tiştî ra
Yêzdanî dikir

hemû roj
ji min ra pîroz bûn
zanîna xortaniya min
wisa gotibû
rastiyeke pîroz bû
gotina Xwedê bû
lê we dijminên min
we şevên min dizîn
firotine bêxewiyê
rojên min
firotine bêkesiyê
we xwe kir
gîyanê nepakiyê
we dizî
ew zanîna jiyana pîroz
ronayiya şahiya hesretê
min ji pakiya giyanê kevokan derxistibû
ev şahiya kovanan
we refek kundên
bê  oxiriya jiyanê
şande ser riya min
firandin ew hesreta min a
mişt ji hezkirinê
min peyman dabû
ku nefretê nas nakim

dema we
ev peymana min bihîst
we hawîrdorên min
ji pirzikên zoxgirtî dagirt
weke korê rêya xwe nas
bi şadî dimeşiyam
we giyanê xwe yê nepak
danî ser riya min
ew riya ku fêr bibûm
we dixwest
nefretê jê bikim
dema min karê xwe yê
zehmet kiribû
nêzîkî cejna serkevtinê bûm
we bi yên ji min hez dikirin
li min da
li dijî min
dirûşm bi wan dane qîrandin
wek ku canên wan
min şewitandibe diqîryan
rastiya we ev bû
hingivînê min ê şêrîn
we bi min kire jehir
cejn û sersalên min
we kirine kovan
dilpakiya min a paqij
we parsekên bêşerm şandine

dilovaniya min
we bi durûtiya
Ahirîmanan dorpêç kir
pîroziyên min
we ji sofîtiya xwe ra
pêşkêşî qurbanbûnê dikirin
dîyariyên nedihatine jimarê
we ji min distandin
pîrozî û rûmetên min
di dûyê bezê we da
difetisîn
Vê carê ji dil
min dixwest rabime dîlanê
berê tu cara
min wisa nekiribû
li ser esmanê hefta
min dixwest dîlanê bigirim
we bilûrvanê min ê zîrek xapand
wî pif kire awazên xemgîniyê
mûyê laşê min
dibûne sing
Bilûra wî
kovanên min nûjen dikirin
di guhên min da dinalî

bilûrvanê kûjer
Amûrê bêtewan dikire alav
ji xirabiyên xwe ra
ji bo govenda serkeftinê
min xwe amade kiribû
coşa min bi awazên mirî ra kuşt
bi dîlanê dikarim
hemû rûmetên xwe
sembole bikim
xweşiya sembolên min
di gewriya min de kuşt
bilûrvanê xwekuj
hêviyên min ên bêhempa
hê min venegotbûn
bi cîh ne anîbûn
di bin parsûyên min ê çepê de
we xwest tune bikin
xeyal û xortaniya min
çawa min xwe ragirt
min li berxwe de
ez bi wan teva re jiyam
derbaskirin ev birîn
çawa ji nûva şîn bûm
ji gorê derketim

lê ya di nav min de
nehîşit dil birîndar bibe
dikare zinaran qet-qet bike
viyana min e
bi salan nehate guhartin
bêdeng pêş ket
bi lingên min
meşiya di riya xwe de
ew birîndar nebû
hê dijî û weke xwe ye
rabe ser piyan
çeng bibe
hemû goran veke
derkeve were,were!
bi te ra şîn dibe
xeyal û xortaniya min
Tu weke hêviyên tijî hatî
li ser şikêrên gorên
ku nedihatine hejandin
ji bo xatirê hevalên
leyîstîkên min
hemû goristana
hilweşîne û were
silav li te û vejîn a
WELATÊ goristanan

31 12 2001 01 01 2002

# *reva ji evîn ê*

Careke din
danî ser pişta xwe
nefret û evîna xwe
mişext bûm ji hêjayên dilê xwe
çûme nêzî ewran
li ber deriyê qeşayê
kenokîya heyvê
û germiya rojê nediyar e
her mij û moran e
roj ne weke rojan e
şev her dûman e
li vê bêkesiya xopan
min bêrîya
Nanê sêlê kir
Dewê meşkê
qebqeba kewên ribat
dîlanên
li ber ronahiya heyvê
heyranokên yarê
her demê salê
ji bilî zivistanê

23 02 1992

# *dîsa*

Qolincên dil
jana evînê
dest pêkir
dîsa…
Agirê Babegurgur
di dil de vêket
dîsa…
dil û cegerên min
kire biryan
firmêsk ji çavan tên
hewara min e
dîsa…
hemêzkirina dildarê
ramûsana wan xweş lêvan
dixwazim
dîsa…
di roja lê burînê
cejna NEWROZê de
bi çar lepan
xwe bavêjime ber piyan
dîsa……

werê xem û kovanan şahî bigirê
bi keç û xortan re
em rabine dîlane
dîsa. ...
def û zirna
ard û asimanan bihejînê
Dîsa….

12 04 2000

# çirûsk

Wek nefela baran lêhatî
dilê me yî xunavgirtî
weke nêrînên li mirinê dinêrin
çirûskên hêviyê
ji dûr ve li me dinêrîn
di cîhana mejiyê me de
bê dengîyeke giran hebû
ronahiya nûvejînê
bi kulîlkên awirên heyvê
di nav kirasê  bê hêvîtiyê de
xwe berdide
ser bêdengiyên
di malzaroka  evînê de
hezkirin û hêvî hişyar dikir
bi çirûska GELAWÊJÊ  re
bayekî nerim û nazik
li gerdûn digeriya
piste, piste  kulîlkan bû
mizgîniyên şîn û şahiyên
dê bên di dane hev

dilên ji evînê tirsiyayî
ji hezkirinê digiriyan
destên ji hev qetandî
ber bi hev direviyan
ramanên kelemçekirî
bi agirê awiran
mexalê  ramanan  dişewitandin
di malzaroka evînê de
bi sedan siwarên cengê
li hev di qulibandin
ew dem nayê bîra zarokan
demeke melûl
melûl….
mezin naxwazin bi bîr bênin
nêrînên mirî
di gevzoka gera bê binî de
dans dikirin
di pêşbirka xulamtiyê de
bi hev re şer dikirin
koma heyî jî
ji hev balav dikirin

lê zarokên tên
wê bajon ser rastiyê
wê bişon guman û mijê
bi hêza ronahiyên
êdî fireh in gavên wan
û dengên baweriyê
dengên îro
nayêne bihîstin li ser lêvan
afirandin ev jiyan
xunava dilê me anî
ewrên dûr ......
yên çav şil
yên li zengilê dîlanê dixin

04 01 2003

## *ez*

Xwezî li nav baxê gulan
gulvanê te
bama
li koşk û eywanan
Nobaderê te
bama
li sûr û kelha Amedê
Dergehvanê te
bama
li kozik û çeperan
parêzvanê te
bama
li nav gelên cîhanê pesindarê te
bama
Tu mîna bûkan xemilî
zavayê te
bama ez...
Perda pêşî ji ser dêmên te hildayî
bama ez. .. ..

25 03 1992

# *xewna biyaniyê*

Min yara  xwe dît di xewnê de
baqekî gulan di deste
dane min maçek di gel de
rondikên çavan
dibarandin bi ser de
dibû tika tika dil
yarê dikişandin keser û kul
serê xwe danî ber mil
ji min re dixwend
destana dil
ez dilerizîm weke simbil
bersiv min dida bi dilê kul
bi dest û bi çavên şil
tu gul î ez im bilbil
me dida hev soz û peyman
ku em bibin yek dil û yek can
yadîgar me bi hev didan
ax…ax dîsa bû xewna şevan

rabûm ser xwe
mîna dînan
roja geş
li min bû zîndan
ketime nav derya xeman
rê hemû
li ber min bûne çiya
ne rê nasim ne rêzan
bûm pepûkê ser riyan
weke masiyê av lêbirî
mîna kalê kurê wî mirî
li biyaniyê çav bi girî
lê bi soz
ji te pê ve
kes naçe vî dilî
her tu kulîlka bihara min î

09 06 1989

## *dilo*

Dilo megrî
ji bo jînê…..
bi fîxan û wê axînê
jîn dijwar e tev birîn e
ew tahl û gir û bi kîn e
gîyan dîlê ling bi lale
dilo megrî
ji bo jînê….
zarokê pêxwas û tazî
bi hêstiran
min derbas kir
bihara jînê
min nas nekir
dilo megrî
ji bo jînê….
xortaniyê bar kir
û çû
pîriyê ew bi rê kir
min ew nedît û têr maç nekir
dilo megrî
ji bo jînê…..

05   07   1992

## *pêla evînê*

Dildara min
vê sibê çavên te
ji roya nû dihilê
ronîtir in
çirûskên ji wan diçin
ji hemû stêrên asmanan
bi şewqtir in
bêhna ji te difûre
ji ya bilbizêk û nêrgizan nermtir e
xunava li ser lêvên te
ji xunava li ser kulîlkan zelaltir e
dêmên te
ji heyva çardeh şevî
sipehîtir e
mirina di riya te de
ji jiyana bê te çêtir e
lê girtina bi destên te
û gera li nav baxê evîn ê
ji van hemûyan xweştir e

01 11 2000

# bûka hêvîyê

Keko
wêneya min bide dayê
bila dayne paşila xwe
pê re razê
sebra dilê xwe pê bîne
neynikê bide dildarê min
tu wî nas dikî
wî yadîgar dabû min
dema lê binêre
wê min bibîne
hesreta evînê
bi rondikên çavan re
derîne
çekoyê bira hê biçûk e
diçe dibistanê
pênûsa min bide wî
wê binivîse dîroka
berxwedana me

şahidên van bûyaran
kulîlkên bi xwîna me
hatine avdan
çûkên bê tewan in
çûkên di hêlîn de
çîçikên şeşling û bê basik dîtine
yên bi dûyê jahrî
hatine fetisandin in
gora bavo nizanim li ku ye
di gotin li kuntara çiyakî
hate kuştin
min nedît dema kuştin
min xwe ne avête ser
çengên xwe li sukura wî ne aland
rûyê wî maç nekir
porên mina zêrîn
dêmên wî ne nixumand
min ” negot bavo
tu yê bi ku ve herî?
me wisa sêwî bihêlî? ”
wî bi wan tilîyên xwe yên qalin
pora min miz neda
rondikên çavên min
ziwa nekirin
bê xatir bixwazê
ji nav me bar kir

min bi dizî hêstir dibarandin
di rêça wî de
dost û neyar dihijmartin
keko
desmala min
yadîgar bide
çiyayê pêşî tu gihayê
bi dengê bilind bêje
keça te
li pey doza te hat
yên din wê werin
di têkoşîna cejna şahiyê de
bi serkevin
xwîşka Nazdar qawîtî kirin
bi çavên şil
ji newala dil
hilmeka kûr, kûr kişand
di serê govendê de
bi xeftanê bûkaniyê
desmal dihajand

09 02 2000

# *te dibînim*

Di dema
em di xew de
Û stêran rê li me birîbûn
rojê pişta xwe dabû me
weke çiyayekî nivîstî
di pêşbirka dîlîtiyê de
dirêjkirina destên te
yên germ
bûna
ava jiyanê ya sar
di piyan de geriye
dema girtina rojê
di nav roniyeke şîn de
û derwêşên hemû olan
rabûbûne duayên mirinê
ji bo me
te got
dem a me ye êdî
hezkirin û şahiyên zarokan.
sibeyên sipî
beyanên zer
ketinên dûr
lehengîyên ku tên
yên me ne

di êvarên
hatina jibîrkirin
di ramanê de
te dibînim
di nav rojên nû de
di kolanên bi befir
di agirên pîrê Laleş de
weke kevoka sipî
bêdeng
di nav gihê de
te dibînim
di başî û rûvekirina
heyvê de
di qolinç û şahiya zayîna dayîkê de
tac li serî
li ser textê
di ramana Xanî de
di nav zelaliya
rondikê de
te dibînim
di ol û felsefê de
di xwendina pirtûkê de
nav şêrîniya awazê de
di êtûna evînê de
te dibînim

08 02 2001

# *dara min bê ber ma*

Min darek çand
li nav baxê Îrem
bi nalînên dilê dayîka xwe
her roj min avdida
bi rondikên çavên yara xwe
min qurban didanê
hêjayiyên dilê xwe
min dixwest
bibê lîsên baz û qomriyan
siya wê bibê
seyrangeha xort û şengezeriyan
îro ji dara min tê
qîja, qîja qijikan
weqe, weqa çeqel û roviyan

26 04 2002

# *hezkirin*

Ji rengekî tenê
hez nakim
ji hemû rengên gerdûnê jî
hez nakim
ji gula bêhnxweş û şeng
hez dikim..
ji jîyana bi zanîn
û çeleng
hez dikim
weke bazê nêçîrê
ji şervaniya jiyanê
hez dikim
ji giyan û dilê azad
hez dikim
weke evîndarê mest
ji serxweşiya evînê
hez dikim
ji lehengên bûne
giyanê dozê
hez dikim
mîna şagirdên MESÎH
ji rastiya bawariyê
hez dikim......

11 12 2001

# *gêj bûm*

Min xwe winda kir
di nav helwestên
bê helwest de
yên nizanin
çi dixwazin
li çi digerin
çi pêwîst e  bikin
bi kê re?
li ku?
kengî?
çawa?
bi çi?
çi bidin?
û çi bistînin?
min xwe li sûka
helwestên şemtok
helwestên şermok
helwestên tirsok
helwestên revok
winda kiriye

10   01   2002

## *dilê min rêzan e*

Bi guhên xew in
û xeyalan
min bihîst
şer rawestiyaye
şervan wê
werine malê
ez bi rev çûm
ji pîrê mirada
min pirsa te kir
got min neďîtiye
birûskên xoşewîstiya te
dan dil
min dilê xwe
xiste destê xwe
û ez ji wir çûm
bi bez
min da pey rêzaniya dilê xwe
di nav gundên wêran kirî re
derbas bûm
çûme nav qaç û deviyên
metîna û Garê
şikêrên Herekol û Çiravê
zê  û Ava Heyatê

min pirsa te ji wan kir
kurê min!
ji Sîsan, Qamber û Mergelo pirsî
çûme Zîlan nav Xirxilên
tendûrek û Agirî geriyam
ji Çemê Murad û Munzir
min pirsiya
li Amanos û Nûrhaq
ji xwedayê şer
ji Nemrutê Mezin
min pirsiya
mîna MANÎ bi lingekî
li  çirûskê hêviyê geriya
min jî dilê xwe
kire çaroxa piyên xwe
li çol û beyaran
li pey şopa te geriyam
kurê min!
min ji darên kizwanê pirsî
min ji bayê çîyan pirsî
min ji rondikên dayîkan pirsî
min ji çavên evîndara te pirsî
gotin me nedîtiye
bi çavên şil
li riya te mam
û giriyam ...giriyam... giriyam...

min pirsa te
ji şer kir
ji xwînê kir
min ji axê kir
ji gêrik û kûliyan kir
lorî û stranên ku
te hez dikirin
min gotin
wênê te
yê li malê mayî
min nîşanî wan de
min got
hê bîst salî nebû
min got
nixuriyê min bû
ji bilî şer
gotin me nedîtiye
min li şer mêze kir
û giriyam… giriyam…giriyam…

di ber deriyê me re
Leşkerên sol bi xwîn
derbas bûn
min tifî erdê kir
dîl derbas bûn
bi lehêngî
xwefiroş derbas bûn
bi tirsonekî
roj derbas bûn
heyv derbas bûn
sal derbas bûn
min hemû dîtin
lê min tu nedîtî
dilê min
di avjeniya
hêvîya xeyalan de
guh li nûçeyên hatina te man
tu nehatî
kurê min!
di destê min de
wêneyê te ma
ketime nav
refên malbatên windayiyan
bi wan re li te geriyam
û giriyam... giriyam... giriyam..!

06 05 2000

## *xewn*

Gelo dibe
ez mirî bim?
lê ez xewnan dibînim
li ser lûtikên çiyan
bi evîna xwe şa dibim
li kolan û meydanên bajaran im
li gundan
di govend û dîlanê de me
li goristana
bi miriyan re
di civatan de me
li ba Hurmuz
li dijî Ahrîman
di şer û cengan de me
gelo mirov dibe
mirî û zindî be?
gelo mirovên mirî
xewnan dibînin?
gelo mirovên bê evîn dijîn
min evîna xwe winda kir
û bûme zindiyê mirî

24 02 2002

# *Li cîhana xwe digerim*

Bê dengiyê dixwazim
bê dengiyê!
cîhekî aram û bê pêjin
ne  pêjina memik hejandina dansoza
ne jî awazên evînî
ewên dilê min
di tixtîxênin
weke sema girtina derwêşan
min hildiperikin
bê dengiyê dixwazim
bê dengiyê
rêzdarino
ji gurgura bajaran dûr
bê wêneyên xapînok
bê hevalên virek
û bê yarên evînfiroş
ku ev rev bê
ji şaristaniyê
bila navê min bikina revok

di ramanê de bê jî
bi te re  bipeyîvim
roniya evîna te
bide min
werê  dil
bikeve mejî
ronîka dilê min î
birîndar ê
weke kevoka serjêkirî

18  01  2001

# *peymana bi cîh ne hatî*

Roja ez ji te qetandim
ji axîn û fîxanên kevokan
ferîştên bihuştê
rondikên  zêrîn dibarandin
hêza şîn  dilê min
çîya û zinar dihelandin
lê neşêm çi bêjim
herweha
rondikên xwînê
dê birêjim
heger hat û li van deran
stêra xwînmij rijiya
û mirim
ku mabin heval û hogir
vê daxwaza
ji pêlên agirê  lehengan
hatî hûnandin
bi cî bînin
li nav Pîkûrêş
li wê derya xeman
di  hewarên te deynin

peymana min hebû
ji gur û kurman re li wir
an li çîyan gur bixwin
an li gorê
kurm bixwin goştê min
Tika dikim  ji te canê
di gel bilbizêk û nêrgizên latê
kulmek ji meçên xwe tî
deyîne ser darbesta
ji evînê mayî birçî
wê vejînin
giyanê bûyî dîlê evînê
tu yê bibîn
çawa vedgerê jînê

07 04 2000

# *evîn digirî*

Wê şeva te
hêstirên çavan bi ser
birîna min de
dibarandin
qêrînên xwe
bi ser nalînên min de
dirijandin
hawarên evîne
kursîyên yêzdanan
dihejandin
cîhan bi dildariya me
dihesandin
mîna perwanên
li dora gerdûnê
gerandim
Ji asoyê stêra jîna min
Rijandin

08 04 2000

## *ma*

Çi karim
bikim ez
heger zarok bigirî
dayîk bişkokên pêsîran veneke
evîndar yarê bixwazê
lê yara xwe nebîne
cengewar li cengê
xwe nûnerê cengê nebîne
pakrewan
cihê gora xwe pêk neyne
dîl li bendîxanê
bi salan rojê nebîne
nîştiman bi hesreta wekheviyê
di nav şer de bimîne
oldar ne oldaran
kafir bibînin
bi navê netew
peymanên bi neyar re
rewa bibîne
wêrek mîna tirsonek
xwe bilivîne
bi peyva yektiyê
me bixapîne
ma çi karim bikim ez

09 03 2001

# *çûna te*

Tu çûyî
ez bi van kovanan re
hiştim
awirên dema çûna te
bûne du xancerên zengirtî
di dilê min de
şaxvedan
çûna te
bû xeyida dilê min
a her roj
hêviyên şahiyên min
ber avêtin
çûna te
bû bahoz û di ser min re
derbas bû
sitûna konê tirsê
di mejiyê min de kuta
çûna te
di nava min de.
valahiyeke
weke newala Waweylê hişt
pira Selatê
di navbera me de danî

çûna te
ez fêrî giriyê bidizî kirim
ji heval û hogiran dûr kirim
bi çûna te re
bajar, pirtûk, pênûs û kaxez
bê deng bûne
ew wêneyên te ku dikenîn
êdî nakenin
ew jî bi min re digirîn.
stranên bê xewiyê
bi min re dibêjin
ev bû paymana me?
bêje
paşî çûna te pê ve
min mertalên dilê xwe
avêtin
çeperên dilê xwe
xirakirin
dilê xwe
bê parastin hişt
min xwe siparte bextê
xeyalên şev û rojan

03 01 2001

## *bêje...*

Wê bi ku ve here?
guvaştina dil
ava di gewriyê de tirş
tûjiya dev
wê bi ku ve here?
bêje.....
neberdane bîranînên sar
bi ramanên mirî re jiyan
wê bi ku ve here?
bêje...
destên hêviyên lewaz
di kolanên bêpêjin de
wê bi ku ve herin?
bêje.....

08 02 2001

# bêrî

Tê bîra te?
şeva min hêviya
xatir xwestina çûna
biyaniyê ji te kirî
tu di cîyê xwe de tevizî
rengê te zer bûyî
çavên te mişte girî
lêvên te lerizîn
gewrîya te xeniqî
zimanê te nepeyivî
ez jî weke dîwarê herifî
min got
zû dê vegerim ne girî
bi dilê şikestî
maçek ji te dizî
şeva tarî
libakirina destên we
min nedît
roj çûn
heyv çûn
sal çûn
çûn, çûûn çûûûn...
temenê min jî
bi wan re çû

min bêriya te kir
min bêriya we kir
min bêriya dayê kir
min bêriya dara Fadil
û dêra Beranî kir
min bêriya serê Latê
û kevirê Şivanî kir
min bêriya hewşa mizgeftê
û Newala Şûşanê kir
bi bêrîkirinê
temenê min çû
bûme kelemberê
li ber bê
gerandim li gerdûn bi tenê
û hê jî têm û têm û têm..!

30 01 2000

## *pirs*

Ji dayîkbûna
li welatê dabaşkirî
çavvekirina
li malbateke windakirî
bi naskirina
zimanê qedexekirî
bûme xwediyê
evîna pêpazkirî
ez im ev
îro ez
îca kî ye
qurbanê dîrokê
Îsayê xaçkirî
yan jî ez ?

15 04 2002

# *hûn nizanin*

Demekê
li vir kurikek hebû
li serdarên bihîvan
bihîv didizîn
li kolanan pêxwas digeriya
leşker û karmendên we
pê dikeniyan
vêga bûye parêzvanê
nasnama
ku we winda dikir
li vir
li ber vê bedenê
keçeke avfiroş hebû
porkej  û xweşkok bû
di nav kirasê  reng û rengo de
çav şermok bû
ew û bihîvdiz
pev re  mezin bûn
di bin siya dûyê
bombayên we de

ji hev hez kirin
bi evîndarî
lê peymandan
ku di bin lingên
hespên we de
daweta xwe  nekin
û çûn
bûn zêravanên çeperên ku
bûne armanca tang û firokën we
hûn vê evînê nizanin

21   01   2001

## *kulîlka min!*

Îro roja bûyîna te ye
nozdeh sal çûn
di nav lehîya agirê dîtina te de
semayê dikim
vî agirî
simbila bihara te jî
bi dilê dayîka te re
kizirand
min jî weke hemû bavan
dixwest bi baqeke gulan
li nexweşxanê
li hevîya qêrîna te
ya pêşî
û mizgîniya  bijîşkê bûyînê bûma
bibûma
şirîkê keyfxweşîya dayîka te
lê  kulîlka min!
min nikaribû
ji ber bi navê me
bûyîn  qedexe ye
li welatê
dibin mîza
hespên dagîrkeran de
difetisê

li welatê
bi sedan dest pêv ra
diçina pêsîrê
welatê
di keçikanîyê de
kirine jinebî
welatê
ku kirine dayîka bîjiyan
em hatine dinê
li vir
hez kirin qedexe ye
ji şer pitir aştî
li ser miriyan bi denggirî
ji bo rizgarbûna
girtiyan
hêvî ji yêzdan kirin
ne tenê hêvî jê kirin
navê yêzdan
bi zimanê me qedexe ye
û navê te yî malê jî
kulîlka min
çawa
bûyîn min nedît
mirin jî
wisa çû Kulîlka min

20 02 2000

## *xwezî bi xwezîyan tînim*

Ez li vê bêkesiyê
xwezî
bi sermastiye avê
ava ber bi nemirina
deryayê ve diçê
tînim
bi awaz bêjîye ba
awazên bê hefsar azad digerin
perdên welatan derbasdikin
tînim
bi dilêrî û  bilindahiya çiyan
çiyayên
ji hêka agir û qaşayê
çiyayên
sing û berê xwe
pêşkêşî lehengên
mîna xwe dikin
tînim

bi viyana dîlê li bendîxanê
viyana nebû leyîstike
destên zabaniyên dojehê
tînim
bi pîroziye evîna yarê
evîna
aramiyê didê Zînê
tînim
di nav  vê demogojiye
bêmafiya cîhanê de
cîhana
dibin alên serok û serkêşên serserî de
xwezî bi sebir û dilovaniya Afiraner
tînim

26   03   2000

# *binivîsim*

Ji te re
binivîsim
qebqeba kewan
dengên çûkan
xewnên di bin konan de
û tepa tepa baranê
xuşîna avê
û bîhna kulîlkên biharê
payîzokên ciwanan
li gel lîliyên şervanan
lê sond dixwim
bi agirgeha Zerdeşt
bi Kaniya Spî û Nûrha Laleş
bi her çar pirtûkan
û bi wê Mishefa Reş
bi van re jî binivîsim
rûyê xiyanetê yê reş

27 09 1999

## *gelo*

Hooo hoo!!
stêrên başûr!
çi dike
şox û şepala min?
di şîn  û reşiyê de
hê  pêçayiye gelo?
hêstirên çavan
hê dibarine gelo?
cihê civanên me
hê dimînin gelo?
rûniştina li bin dara tûyê
hê tirs û saw e gelo?
ronahiya heyvê
hê evîndaran
ditirsîne gelo?

ew çavxezal
hê li hêviya min
dimîne gelo?
ma pirsa min
ji bayê bakur
dike gelo?
êl û ol xoşewîstan
hê  dişewitînin gelo?
ji min re
çima nabêjin
ma hûn ji bersivdanê
ditirsin gelo?

03   03   2000

## *xeyal pîr nabê*

Sînema min
dem û dewran derbas bûn
lê xoşewîstiya dil m e
ciwanîya min jî çû
lê hêviya dîtina te m e
tu bûyî
hevala jiyana min
di şevên bi tenê de
tu bûyî
xeyala min
di tirsê de
tu bûyî
dilêriya min
ew maçên te
bûne sedema
nemiriya min
xwezî zimanê evînê hebûya
û bi dilê xwe re
bi peyîvyama
lê te digot
zimanê evînê
di  hêviya çavan de ye
di lerizandina
lêvan de ye

di nav
zelalîya rondikan de ye
Evîna te bû
roja jîna asmanê min
bû pêpelûkên agirgeha
Zerdeştê Kal
bû toba
mirîdê Pîr Şalyar
bû evîna
derweşê  li şîkeft û nawîsan
yên  bi  dilşahî
li hêviya mizgîniya yêzdanan e..
çendî dem û dewran biçin jî
tu di îstegeha dil de yî….
di awirên çavan de yî…
di bîra ramanê de yî…
di gewoza nav lêvan de yî….
sînema min

16   03   2000

# *dosto*

Erêêê, erê dosto.
ez û tu
mîna kewên ribat dixurin
ji şervanan şervantir in
ji lehengan lehengtir in
ji zaneyan  şehrezatir in
belê, belê rast e  dosto
lê em  ne li şer in
û  tehlîyên  şer nizanin
em nabêjin
ku şer
dayîka hemû nebaşiyan e
plan û neqişên şer çêdikin
negurkirina şer rexne dikin
bi bêşermî em xwe
mîna Kulavreşê Mêrgewerê
leheng
ji bazê  Germiyanê Mamerîş
şervantir
weke serleşkerê Botan Egîd
xwe welatperwer dibînin

lê cîhê me germ e
û em ne birçîne jî
were em bipirsin
ji şervanên birîndar
ku kurman girtiye birînan
ji zeriya evîndara
gulî spîkirî li mala bavê
ji dayîkên pakrewanan
ku nizanin li ber kîjan darê
an latê
ji kîjan stêrê re bigrîn
ji mîlyonên derbiderkirî
û bi hesreta bax û bostanên xwe dipojinin
yên mirîyên wan
bêrîya we kirin
were em bipirsin
û herine nav cîhana pirsan
ji dîlên dengbirî
ji nalînên Leyla
ji qêrina Zîlan
ji zarokên bê dê û bav mane
bipirsin
ji dîplomatên li ber deriyan têne qewitandin
ji xaziyên bê dest û bê çav mayî
xweşî û nexweşiya şer ji wan bipirsin

lo…lo…dosto
li kevir û kuçan
ji dar û beran
ji kew û pezkûviyan
ji pirpirîk û kîvroşkan
bipirsin  ka şer çawa ye
hilo,hilo rabe, rabe dosto
em herin bipirsin
Looooooooo…!

04   04   2000

# *geryaneka di xewnê de*

Di asoyên xewnên min de
govend û dîlan e
nizanim  govenda mirinê ye
an a jiyanê ye
dengê defa defvan der nayê
dengê bilûrê bi melûlî tê
dengê tembûrê bi şahî tê
mirî di şahiyê de ne
zindî di şînê de ne
yên  ne mirî û ne zindî
di dudiliyê de ne
Ahrîman û Hurmiz
li ser mêza kişkanê li pêşberê hev in
li aliyekî stûxwar û belengaz
li aliyê din Bekoyê Ewan û fêlbaz
bûne temaşevan
leheng ditirsin
tirsonek dikenin

cengewar
ji meydana cengê diçin
kutxur li meydanê
şûrê cengê li ba dikin
rovî bi xaponekiyê dikenin
şevşevok  li ber ronahiya rojê
li dora wan difirin
Hecheckên me digrîn
Bazên hêviyan
bilind difrin

28   08   1999

# *Lorîna pênûsê*

Bêhna xwînê ji min tê
ez ne mirovkuj im
ji her aliyên min xwîn dipale
sond dixwim
nebûme kujer
ev bêhna xwîna bapîrê min e
ji min tê
dema ew kuştin
xwîna wî
pijiqî ser pêçeka min
hê ew xwîna ji min dipale
û qêrîna xwîna bapîrê min e
hê di guhên min û derya dengan de
dilorînê
dixwazim ji te re
bihara aştiyê pêşkêş kim
ne xopaniya şer
ez şer nas dikim
bapîrê min di şer de mir
bavê min jî
agirê tifika
dayîka min vemirandin
û ew dîn bû

xwişk û birayên min birin
êdî bi paş de nezîvirîn
maleke me hebû
mîna hêlîna bilbilan
em tê de şa bûn
lê baxê me
dixemilîn ji kulîlkên hinaran
şer dizanim
şer naxwazim
cihê guh li navê şer dibim
Yêzdan bi bîr tînim
spasî jiyanê dikim
çi kulîlkên ku dibînim
bi wan şa dibim
naxwazim biçilmisin
ji duyê jehrê careke din
lê naxwazim
dîl jî bijîm
bila kulîlkên me jî
weke kulîlkên cîrana bêtirs
bibişkivin
û wan kulîlkên bêtirs
yên bi girî yê dilê dayîka min
hatina neqişandin
ji te re pêşkêş kim
xweşika min

04 05 2000

## *hesret*

Di nav derya
xewn û xeyalên
hesreta te de
pîr bûm
ev çend
payîzên pelweş ên diçin
Û min di kahiniya
xaman de dişon
çend biharên gulfiroş
min li suka dîla  difiroşin
ev bû çend havîn ku
min di doheja tewanber de
dişewitînin
min pira xeyalan
di navbera dilê xwe
û evîna te de
çêkir
ji hesreta hilma te
bayê şevê
bêhn dikim
ba ji agirê hesrete min
reviya

li heyva  asman dinêrim
li melûliya çavan
heyv giriya
bi kevoka
pencera hêviyên xwe
Şa di bûm
îro ew jî firiya
di nav tirs û tariya şevê de
li çirûskên çavên te
geriyam
bi nedîtina çirûskan
dil giriya
ji rondikên hesretê
dêmên min riziyan

24   10   2001

# *dilbera min*

Dema dilê te
di nav ronahiya çavan re
herikî dilê min
û kete nav stêran
hemû çavan xwezî
bi govendgirtina mijgûlên çavên te
dianîn
dema min tu
maç kirî
giyan pêhatina te
min dît
çavên te
xwe dispartine melûliya stêran
bi maçkirina te re
stêr diketine dilê min
tu dibûyî bûka rojê
çavên te
ji stêran spehîtir dibûn
mîna zelalîya deryayê
zelal dibûn
wê kêliyê
neşêm bidime nasîn

çavên te
bibûne kaniyên
bêhempayê gerdûnê
ne dixwestin
govendgirtina mijgulan raweste
ji hezkirina jiyanê mişt bûn
bi nêrînên
baweriya zarokiyê paqij bûn
bi salan avdana
çem û rûbaran şa bûn
ronahî direşandine
ser dîrok û mirovahiyê
şevê din
guh li helbesta çavên te bûn

Dilbera min
nêrîna helbesta çavên te û pê de
pêwîstî bi nêrîna
tu çavan namîne
fêrkirina her tiştî
tê de heye
kî dizane?
dibe ji ber vê be
heta dilê min janê bigire
dixwazim li helbesta çavên te
guhdar kim
careke din
cara dumahiyê
dikevime xeyalê
ku bikevime nav helbesta çavên te
lê nabe
li vê de
an li wê de
ev pir nêzîk
wê were der
bawer dikim
mîna rojê
wê hilê ev helbest
hêviya min
bi paşerojê heye
bi hezkirinê heye

Dilbera min
di nav tehliyê de
temen diçû
bê dengiyeke
dirêêêj, dirêêêj…..
di çavên te de hebû
qîrîn û hewar
weke gereke bêdûmahî bû
ji bo vê
jiyan nîvcûtî ma
cara pêşî
ku te dilê xwe dayî min
berî niha
bi salan bû
di nav werzê şimamokan de bû
gûliyên te şil bûn
çavên te bi xunav bûn
di destên te de
baqekî gulan hebû
tu li civanê min
di bendîxana
bê aramiyê de difûrî
Te got
bi ketin û derketina dilê min
tu ê berz û bilind bibî

Dilbera min
bi nêrîna çavên te re
cure, curên
jiyanê min di wan de dît
min xwe
di wan de şûşt
di  nav wan de
min xwe neqand
mîna gula nû pişkivî
lêvên te
bi dilovanî
nêrînên
çavên te
weke nêrîna hilata rojê ye
dil germiyê wê bigire
weke gera baxê qedexekirî
weke riya dûmahî lê ne wê ye
her û her mirov bimeşe

Dilbera min
dostanî û pêkvebûna me
tu pê dizanî
ku yekîtiya dijberiyan e?
kî dizane
dibe ku ji ber vê ye?
dema te
di nava xwe de
nabînim.
ne helbest û ne raman hene
lê çaxê bayê te tê
dişêm paş sînoran bipîvim
helbesteke şêrên î tû
min ji vê helbestê hez kir
di nav vê helbesta mezin de
min xwe de xwarin
wê şevê li nav baxçên gulan
li te digeriyam
ji xweşbêhna gulan mest bûm
min ji gulan re
gazin dikirin
min dît
pirpirîkên ser gulan jî
guhdar dikirin
xweziya mina mezin î tu
helbesta mina mezin î tu
rastiya mina mezin î tu

dilbera min
te ronahî pêşkêşî min kir
ji ronahiya te serxwaş im
awaza di çavên te de
rêwitiya herî dirêj e
trajêdeya mezin î tu
dibe ku ji ber vê ye
tu caran min xwe
ji nebûna te re
amade nekir
nêrînên te
weke ronahiyên
di sarincê dan
di baxê nazelîn de
difetisin
min dît destên te
ronahiyê digirin
di riyên asmanê şîn de
stêrka zer li paş çiyan dihila
cîhana ronahiyê dibirî
bibû pira
paşerojê di nav şevê de
di nav tehliyê de
derbas dibû çerx

lê çi dema te
bi bîr bînim
helbest ji nû ve dest pê dike
û  jiyan derdikeve tê
hişê min
li dera helbest û ronahî lê ye
hatiye girêdan
cîhana min
di siya wan çavan de
li xwe digere
ew kenê te yî
tenik di bin konê şevê de
û bi dizî jimartina stêran
min jî roj girêda
da  jiyan neyê tarîkirin
bi destên xwe neqişê şahiyê
li asmên çêkir
kenê te
di nav helbestê de
bi min re
ez gîhandime ciwanî û  spehîtiya felsefê
têrbûn
ji êvariya çavên te
nabe

Dilbera min
dema li ber ronahiya stêran
min tu maçkirî
hingivî diherikî
di nav lêvan de
rêç ji jiyanê re teng dibû
di nav xwe de
û di çiyan de
bi cî nedibû
xirexira evînê
dima li ser rûyê erdê
lê çi di dilê min de heye
di parastina rojê de ye
di kakilka xwezayê de ye
di çav û dilên dildaran de ye
dibe ji bo vê be
ji bo bigîhîjime te
ji te
direvim
bi wî dengê te
yê xweş
strana raperîyê guhdar dikim

bipejirîne
van herdu hevokan
bike nav refê dilê xwe
bila di bin toza salan de
bimînin li wir
ji te re hatiye gotin
pey bilindbûna
wan hevokan
rastî tenê di herdu çavan de ye
di nav herdu çav kevokan de ye
ev çav
mirovan dibine mirinê
an dibine serkeftinê
bûme bendiyê
wan çavên te
û wê ala serkeftina te
min tu
di nav dilê xwe de
di helbestê de
di dostaniyê de
di hevaltiyê de
di evînê de
xwedî kirî

dilbera min
gulên ji çavên te
dikevin
di nav wan de
ronehiya helbestê heye
dinya û dildarî heye
kaniya
ava jiyanê heye
mirovê bi tenê
êdî qedirê dildariyê zanê
wate jiyana min
xeyela dildariya te ye
çaxê min tu
maç dikirî
helbesta dildariyê
dibû awaz
diçûme cîhaneke nenas
Stêr di dilê min de hildihatin
bi maçkirina te re
gotinên pêşiyan dibûne rast
bêhina gezwa çiyan
ji devê te dihat
bêhna Azadiyê
ji gezowa çiyan tê
te qet bilbizêkên
çiyan bêhn kirine?
bêhna wan kulîlkan

ji te tê
bi te re
ewqasî mest im
çiyan dirawistin
dilê min
hesinê keştiya xwe
davêje deryayê
ew çiya dilêriyê didin
evînê jî didin
li gel azadiya jînê
evîndarî awazeke nayê gotinê
evîndarî kenê
li ser lêvên lehengên
li ber tîrebarê ye
peyva wî ya
dawiyê ye
qêrînên biçûkên
nû têne jiyanê ye
dibe evîndarî
awirên me bin
bi bûkên çavan
gera bê wate be

Dilbera min
tu
bi kersantiya min re
wisa bûyî yek
û te di dilê min de
cih girtiye
roj bi rojîtiya xwe
neşê te
ji wir derînê
weke dildariya dûr
ku bîranînên wê paqij
weke nama evînê
hê nehatî xwendin germ
gulîyên te
neşiyan xwe
bi kevokan bidine pejirandin
êşa xençera dîrokê
di pişta min de zeng girtiye
kevoka evîna min tu yî
kevoka aramiya min tu yî

Dilbera min
ji min re bêje
Di ku dera dil de
te veşartiye helbesta me
an di nav baxê dil de
li seyranê ye
tu dizanî jiyan hemû
di çavên te de ye
heta îro
kiryarên ciwan û spehî
min dîtî
di çêkirina çavên te de
min dî tin
di nav wan de
evîn heye
azadî heye
rûmet heye
rêzdarî heye
ji nav ronahiya xwezayê herikîne û hatine
dema dikevime nav ronahiya wan
li nav stêran digerim
neqişên stêran di çavên te de ye

Dilbera min
min tu ji awaz û helbestê afirandî
ji ronahiya peyva zanatiyê
hêêdî, hêêêdî……
dilooop, dilooop palandî
paşî di kûrtiya
jîn û ronahiyê de veşartî
ez bi te re
li ser vê holejînê bextewar im
ji ronahiya salan jiyam
şilbûna dilê min
ji hêstirên çavên te
yên pêşî
lê wêrekî
li gel hemû kul û kovanan
zanîna hezkirina evînê ye
yên di bin van mercan de
helbesta dîroka evînê gotî gewre ye
mirov bi evîna xwe re heye
an ne li jiyanê ye
ji zimanê xwe
fire şîrê ku tu
didî min
hemû astengîyên
li pêşiya xwe radikim

dilbera min
mîna ez ji rayên te
hatibim afirandin
min tu
anîbî cîhanê
ji te hez dikim
wer dibêjim
ji me herdûyan û pê ve
kesî din nîne
li vê cîhanê
dîwar hemû hatine herifandin
sînor rabûne
li çar terefan
kevokên zanistiyê difirin
tu
weke birca ku neşêm
bikevimê
li ser hemû riyên min î
te
derbasî helbestê dikim
di nav helbestê de
dimeşînim
weke zaroka nûhatî
te bêhn dikim
mîna kulîlkên dara belalûkê
bi nazelînî
li te dinêrim

bê deng dibim
cihê helbesta evîna te
dest pê dike
tu kevoka min a çar çeng î..
tu zeviya min a çar reng î.
tu ramana min a çar deng î.
tu kaniya pênûsa şeng î.

19 04 2000

## *ez û xwe*

Ez Yêzdanê xwe bama
ezê weke xeyala xwe
azad bama
weke bîra xwe
pira kevineşopî
û nûjeniyê bama
weke dilê xwe
mestê evînê bama
weke lingên xwe
zîrekê revê bama
weke destên xwe
bi hêz bama
weke hêstirên çavên xwe
bi av bama
xwezî ez
ne ez bama
ez afiranerê xwe bama
min ê xwe ne afirandi bana

27 01 2003

# *şahiya bi tirs*

Di serkaniya
hesretên min de
çûna bihuşta
agir lê dadayî heye
bihuşta derpiyên hesinî
li bûkên wê kirî
zavayên wê serjêkirî
birazavayên wê
hatine xesandin
bihuşta Ahrîmanan
navên xwe lê kirî
bihuşta kirasê girî
li bejnê kirî
bihuşta Yezdanan
pişta xwe dayê
Pêxamberan jê barkirî
vegera wê
di ser kaniya
hesretan de difûrê

di çavên min de
vêketina çirûskên
sê darikên li bendîxanê
sê darikên
bûna dîrok û daristanek
ji pêşe rojê re destanek
ronîkirin tarîstanek
çar agirên bûne canek
germ kirin zivistanek
bûna gulistana meha gulanê
dengê dîlana
bûka serbedenê
bûk a bûyî sersal
bûyî zayîn
bûyî edet
bûyî gazî û hewar
di mîjiyê min de ye
ez ê herim
û van bajerên mezin
bi cih bihêlim
ez ê herim û bila cîranê min î nêzîk
li min bidê

bila kêra xwe zengirtî
ji paşila xwe derênê û êrîşe bêne ser min
min bi cudaxweziyê
tawanber bike
ji kuştina min re
xwe mafdar bibîne
lê dîsa ezê herim
mêrg û çîmanên
bihuşta xwe bibînim
temaşayî dama biharê kim
ro pencên xwe berdide  ser jiyanê
xwazayê ji xewa zivistanê
hişyar dike
zamîn avis dike
ajel dizên
firinde hêlînan çêdikin
ez ê vegerime
navê min
di dilê xwe de
xweyîkirî
navê deriyên
hemû curên evînê
li ber dilê min girtî
ez ê vegerime
ber tifika dayîka xwe
bi şahiya yadîgeriyê şa bim

di bin asmanê şîn de
Stêrkan yeko, yeko bihijmêrim
bi vegera min
seyê me yê belek
û kitikê me yê çav şîn
wên bi coştir
dûvên xwe bihajênin
xwe bi min xweşik bikin
bêyî ku ez
xwe ji xwêdana
koçberiyê bişom
dê bibime temaşevanên wan
li bênderan
li ser lodên qerselê
xwe bavêjime ser piştê
avjeniye heyvê
li asmanên zelal temaşe bikim
evîna Leyl û Mecnûn bibînim
ev ne çarenûsa  min e
cîran bidine pey min
û ez birevim
her stranên biyaniyê bêjim
û bi awazan re bigirîm
çiqasî xweş bû
hezkirina  me
mîna çûkên
ji neçîrvanê xwe jî

tore nebê
di OL û bîre me de
torebûna
tu nijd û OLAN nebû
çiqasî xweş bû
ji her tiştî hezkirin
lê  li hember vê hezkirinê
titişt ji xwe re ne xwest
Germiya rojê
di hesilî vê merdiya me
ez ê vegerim
û gazî bikim
tu li ku derê yî?
evîna min a bêdeng
Şahiya min a bitirs

11   01   2001

# *stêrên bê gor*

Mirinê mizgîniya
mirina min
da min
min ew nedît
qijikan
çavên min xwaribûn
rondik jî
êdî nikarîbûn
ji wan werin
nayê bîra min
ku ez kefen kirim
dengê giriyê
dilsozan jî
nehate min
min ji yên
darbesta min hilgirtî re jî
Spas nekir
lê çawa ez mirime?
mirinê got
mirina te
ne weke mirina  xelkê bû
di şer de tu mirî
ya rast
tu kuştin

şer hate bîra min
û bi mirina xwe şa bûm
min nikarîbû
bikenim
roviyan lêvên min
xwaribûn
ji maçan
bê par mabûn
lê yara min
hê li hêviya min bû
min pirsa dayîka xwe dikir
gurek hat
devê min  vekir
zimanê min
derxist û bir
mirin jî
ji ba min çû…
stêran ez birim
an min ew xwarin
ne digirîm
û ne jî şa me li vir

11   05   2003

# *xwe bişîne*

Min dixwest
tu li cem min bûna
û ez ji şahîyê
mişt  bama
li vir şeva
bêdeng ji xewe hişyar bûm
û min serê xwe
danî ser xeyalan
şeveke bêpêjin
herder di bêpêjniyê de
hişk bûye
stêrên asmên û şîniya wî
stêrên ji hev  cuda jî
di bêpêjnîyê de
bûne yek
asman, stêr û xweza
di bêpêjniyê de
hatine hunandin
bêdeng ji xewe hişyar bûm
û ez jî
di nav tevina bêpêjniyê de
hatima rêstin

ji her tiştî pirtir.....
ji hemû evînên cîhanê
ji evîna av û axê
ji evînên şad
ji yên di agirên kovanandan
fetisîne
ji a pirpirîkên ronî perest
ji van evînan
hemûyan pirtir
pêjna te dixwazim
bêdeng ji xewe hişyar bûm
û min li ser tariya şevê palda
xoşewîsta min
te li hember xwe dibînim
lê tu napeyivî
destên te
di nav destên min de
xwê nadin
hilma te
min germ nake
kenê te
perda bêpêjniyê nadirêne

bîranîn  jî
vê gavê têrê nakin
bîranîn
min mest dikin
di nav bêpêjniyê de
min ziwa dikin
stranên evînê jî
ji aramiyê re kêm dimînin
ne, ne
ne wênê xwe
xwe bişîne
bi tavên baranê re
xwe bi rê ke
bila maçên te
lêvên min tewaf kin
ji xunava Laleşê
têr avkin
dema tu dimeşî
dema tu dipeyivî
dema tu dikenî
dema tu kulîlkan jêdikî
dema tu agir digiriyênî
bi agirê evîna xwe
ne wênê xwe
xwe bişîne
û min ji şahiyê mişt bike

di nav befrînan de
di nav rondikên ewran de
di nav baxê gulan de
xwe bişîne
û xwe bi rê ke
kenê te bibînim
û bi hêvî bibim
dilê te bibînim
û li ber xwe bidim
da nefesê bistînim
te dixwazim
xwe bi rê ke
û ji min re bişîne…

14 06 2003

# *vegera jîyan ê*

Mîna pingbûna avê
pingbûna hêrsa dilê xwe
tu diparêzê
bi stranên mêrxasan
Yêzdanên derewîn  radikê nimêjê
kulîlkên tolhildanên
mijgulên te
xemilandine
lehiya ramanan
di ber çavên te re diçin
hişê te
li çiyayê govendê ma
li kemîna
çemê Benavoke
bêdeng stranan dibêjê
bi bayê awazên  xwe re
te hemû pût
rakirine dansê
vêga dest pê kir
strana lehengan
strana bê guman
stranên xwe di rûbarên
gumana de şûştî
dest pêkir bira!

pelên darên mazîyan
mîna kevokên birindar
dinalin………..
nalînên pelên daran
dibin awaz û lorîyên dayîkan
kulîlkên Benavokê
di şînê de
dilerizin
çiyayê govendê
di nav derya   agir de
dihejê
Cîlo û Feraşîn
ji tirsa digrîn
tîrêjên rojê
di ser govendê re
xwe berdidine
ser neqişên
ji rondikên dayîka te
mîna ketina stêran
hun  ketin
çeka te
xwêdangirtî
di destên te de
tevizî
heval û hogiran rahişt
xencera te

li Benavokê ye
hezkirina biratiyê
hezkirina hevaltiyê
li wê de ye
xelata dîrokê
tolhildana êşê
li wî xakê
bi hesreta serkeftinê
hatî stirhan
erê, erê şêrîno
erê ezîzo
dev ji strana mêrxasan
bernede
û vegere jiyanê
herikandina awazên
ba yê çiyan
gulên hêviya jiyanê ne
destûrê bida
bila baran
êşa dil bireşênê
bişwê kîn û xemgîniyê
destanên kevin
bi xwîna
li dîroka virek
binêre
dîmenên bi xwîn

bi nivîsa
firotina zarokên me
li sûk û bazarên rûreşan
kuştina lehengên dozê
bibe wênekêş
strana  li ser ziman winda
dilopa xwînê
di kenarên lêvan de
hişbûyî
ramanên di mejî de sar
fermana
di gewriyê de xeniqî
awirên bi xwînê
dirijina
ser zinarên bê ax
bike pirpirîk û bifirîne
xwîna li erdê
nimêjê ji zaliman re dike
kirasê rengê
kulîlkan lê hişkbûyî
bibe mîna Ferhad
peykeran çêke
peykerê kevin û nû bike yek
bila fêr nebin
ji pirtûkên dîroka virek
ji mamostayên zalim¨

bi kînê bistirha evînê
bi tolhildanê mezin ke
evîndarîyê
bila ji te
fêr bibin her tiştî
û dîrok ji nû ve were
nivîsandin
keştiya bihara te
li bejê maye?
awirên te
sar bûne
ava hêviyê
qedîyaye?
di nav kemîn û davên
durû de
xefkên xwefiroş
xemgîniya danê êvarê
pencera rûyê te
girtî ye
bêhna kulîlkên Benavoke
li ber pozê te
dans û semayê dikin
bayê çiyan
baweşînê li gûliyên te
xwêdangirtî dike

çemê xwînmij
li defa cengê dide
çar teref  tijî bûne
ji dengê fermana Cimşît
rabe binêre
Leyla jî li ba te ye
lêvên te ziwa
tu tî yî?
bi strana ”Şahîno”dilê xwe
hênik dikê
kulîlkên tolhildanê
mijgulên te
xemilandine
li dijî
berdoş û serserîyê gerdûn
ba wê bibînê
Ala me
zeviyên me
tovê hêviyên me
û hêstirên îro dibarin
ji çavên roja me
çavên te
li dûr dinêrin
tu evîndar î
Ciwano....

porê te
belav bûye
di nav xwêdana xeman de
kulîlkên hêviyê
li vir in
rojên tên
yên me ne
lê ku nerawestê
eniya zayîna zaninê
sar nebin
çekên xwêdan girtî yên
tolhildanê
wî çaxî  stêra sibê
a  me ye
asoyê beyanê
li aliyê me ye
roj wê
bibê ya me
dev ji stranê bernede
vegere jiyanê
dema vegera
Meydana şahiyê hat
bê hêviyê vegerîna hêviyê
şikestinan
bike serkeftin

dêm û çavên ji bêhêviyê
ziwa bûne
rubarê hêviyê
bi ser wan de vale ke
dema dengê te ye
xwe bi ser
sur û bedenan de berde
aso bigre
Leşkerê hêviyê
Mazlumê biçûk
gula Mamediya
stêra Çiyayê Agirî
sebr û aram vala ye
êş û evîn çêka te ye
ku lêdana dilê te
êş û kîn
an şahî û evîn bê
me di teşta dile xwe de
bistirha
û bike hevîrê jiyanê
xweşiko......

19 06 2003